Jîna Emînî di 16ê Îlona 2022an de, piştî ku li Tehranê ji aliyê "hêzên exlaqî" yên girêdayî Rejîma Mela ya faşîst ve hate girtin, bi hinceta ku wê serpoşa xwe "bi awayekî guncaw" li xwe nekiriye, hate kuştin.

Em careke din ji her cihê ku em îro lê ne, serhildana jinan bilind dikin ku li Îranê bi kuştina Jînayê bi dirûşmeya Jin Jiyan Azadî dest pê kir û li seranserê cîhanê belav bû.

Em baş dizanin ku heman hişmendiya ku Jîna kuşt, îro jî li çar aliyê cîhanê maf, jiyan û destkeftiyên jinan desteser dike. Jinên ku li dijî rejîmên serdest ên mêrperest serî hildidin û ji bo maf û jiyana xwe têdikoşin, tên hedefgirtin. Rejîma faşîst a ku Jîna kuşt, îro çalakvanên jin Pexşan Ezîzî, Werîşa Mûradî û Şerîfe Muhamedî mehkûmî mirinê dike.

Li Îranê polîtîkayên bêdengkirin û tirsandina jinan bi rêya cezayê darvekirinê, ji polîtîkayên şer ên ku hêzên emperyal ên cîhanî li Rojhilata Navîn dimeşînin ne cudatir in. Emperyal dixwazin li gorî berjewendiyên xwe ji nû ve teşe bidin Rojhilata Navîn, vê armanca xwe jî bi dijminkirina gelan pêk tîne. Rejîmên mêrperest xurt dike û jin ji hêla van rejîman ve tên hedeftirtin.

Zihniyeta ku Jîna kuşt û hewl da jinan bi cezayê mirinê bêdeng bike, heman zihniyet e ku li Afganistanê burqaya reş li ser jinan ferz dike. Heman zihniyet e ku li Iraqê pêşnûmeyên zagonî yên ku îstismara keçan qebûl kir derxist. Heman zihniyeta çeteyên Selefî ye ku jinên Elewî û Durzî li Sûriyeyê hedef digirin.

Em li ku derê bin jî em ê li dijî hemû êrişên li ser jinan û jiyana wan têbikoşin. Em têkoşîna azadiya jinan a ku me li herêma xwe mezin kiriye bi dengê jinên li çar aliyê cîhanê dikin yek, em serhildana xwe mezin dikin. Em bang dikin ku demildest cezayê darvekirinê yê li Îranê bê sekinandin.

Têkoşîna Pexşan, Werîşa û Şerîfeyê têkoşîna hemû jinan e ku li wekhevî û azadiyê digerin. Tiştê ku li Îranê divê were kirin ne pêşxistina faşîzmê ye, lê avakirina jiyanek li ser bingeha azadî û wekheviyê ye. Îro, divê binpêkirinên mafên mirovan ên ku li dijî girtiyên siyasî yên jin, bi taybetî li Zindana Evînê û hemû girtîgehên din ên Îranê ne, bi dawî bibin, polîtîkayên yekperest, zayendperest, olperest û mîlîtarîst bên dawîkirin, cezayê îdamê bê rakirin û demildest serbestberdana girtiyên siyasî yên jin bê misogerkirin.

Bi serhildana Jîna Emînî re, em ê hevgirtina xwe bi jinên Îranî û çalakvanên jin re zêde bikin, têkoşîna xwe ji bo bidawîanîna cezayê darvekirinê û avakirina jiyaneke azad û wekhev bilind bikin.

Bijî Têkoşîna Jinan

Jin Jiyan Azadî